Newroz Hejmar (68 -69) Rûpel (3) Hizêran-Tebax 2006z – 2618k

Hevpeyvînek ligel sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê – Mihiyedîn Şêx Alî - Hevpeyvîn: Xalid Heno - Malpera Avesta

www.avestakurd.net

*** Birêz Şêx Alî,di serî de xazim hûn, xwe bi xwendevanên Avesta bidin nasîn... Şêx Alî kî ye?**

Li bajarê Efrînê sala 1953 –an hatiye dinê. Li dibistanên Efrîn, Heleb û unîvêrsîta wê – beşê ingilîzî – xwendiye, bê ku bi dawî bike.

Di warê perwerdebûna siyasî û kartêkirina mirovane de, li Helebê di salên (1969 – 1973) –an de ligel Dr.Nûrî Dêrsimî, û li salên (1980 – 1993) –an li Þamê li gel Osman Sebrî weke şagirtekî têkildar bû.

Dê Kurd e, ji gundê Coqê – herêma Kurdaxê – ji êla Çeqeliyan, navê wê Hebîbe ye. Ji kurdî pê ve tu zimanên dî nizane . Bav jî Kurd e, koçer e, ji êla Delkî – Mîrşemî, ji gudê Berbiyan – herêma Îslehiyê – navê wî Şêxmûs e . Piştî serkeftina Mistefa Kemal, hikûmeta Anqerê paşnavê Mîrşem ji defteran rakir û paþnavên tirkî mina Ataş, Ûnlu, iliksoy, kose, Aksoy….xistine şûnê . Îro ew koçerên Mîrşemî bi sedan mal û kes li bajarên Îslehiyê, Entabê, Meraş û Istenbolê bûne bajarvanî, bi cî û war in . Dema şerê Seferbirlikê (1914-1919), Þêxmûs derbazî gundê Dêrsiwanê – hêla Kurdaxa Sûriyê – dibe, çend salan lê dimîne, dû re berê xwe dide Efrînê û tê de dibe xwedî hin berjewendiyên aborî . Ew nozdeh sal û şeş mehan di hêza leşkerî ya firansiyan de weke zabitekî biçûk dixebite . Ta îro jî alikariya diravî ya mehane ji dewleta Firansî ji bermaliya wî re berdewam e . Li gel mezinê Êzdiyên Kurdaxê Derwîşê Şemo – gundê Qîbarê -, Kamîran Bedirxan û Rojê Lêsko têkildar bû . Ji bilî zimanê xwe yê Kurdî bi Tirkî û Firansî jî dizanî .

Li Efrînê, li 1968 –an Sêx Allî derbazî nêv tevgera siyasî a Kurd dibe û li havîna 1972 –an, ji ber xwendevanên kurd li Helebê tê helbijartin û digel hevalên dî diçe li kongira yekem li payîza 1972 –an ya ku bi rêvebiriya birêz Reşîd Sindî nûnerê nemir mile Mistefa Barzanî li nêzî Bamerna Kurdistana Îraqê beşdar dibe, Vêca ji hîngê ve û ta niha jiyana xwe terxî Tevgera Kurd kiriye, ji siyaset û rewşenbîriyê pê ve, di tu warên dî de kar nekiriye . Li 1974 – an belavoka Azadî – Elhuriye – li ser navê komîta herêma (Kurdax, Heleb û Kobaniyê) bi alikariya hin hevalên dî derdixe û dide belavkirin . Di kongira diwem ya partiyê ya ku li Sûriyê 1977 –an hatibû lidarxistin ew bona rêvebiriya partiyê têtе helbijartin û dibe endamê komîta navendî û dûvre ya siyasî . Li

——→